BERZEBÛN

Îhsan Hesen

Di gel
Barîna baraneka damayî û
Di nav tirajîdiya
Ewrekê gerok
Di gel henaseya
Deriyayeka bê tûxîb
Û sema komeka
Zarokan li ber awazên
Zengilên dêra
Wêneyek
Tablûya cadeya bajêrê min
Di girinjîneka sar de
Dubare dike

Ev dîmen e
Di hezên min yên bêguneh de
Peya dibin
Di dîdara jivanên min yên hero de
Panorameka xweragiryê
Radihêlan
Nehêz tirsê
Di xewnên min de feramoş dike
Ne gaziya
Zivirandinê manşêtên mijûl
Bi çîrokên haşatiyê ve
Berze dike
Ez neşêm nêrînên te
Di kirasê xwe yê diryayî de
Bikime pêşangeheka
Efsaneyî
Hêşta nexş
Ser û çavşş û rûyên te
Di paxlên kevlokî de
Serhatiya bêdengiyê
Di dilê min de
Di çînît
Bes tiblên me bi hilkêşin
Ev çerxê
Xatirxwastineka bi lez e
Nêzîkbûna rojên
Gerim
Bangê dijwariyê ji min ra
Taxê me dilorîne
Siruştê wê jî
Di gel awazên
Eşqeka beranber
Hezeka aramiyê
Di bîrhatinên xerîbiyê de
Hevber dike
Kî jê berpirs e?
Ez, tu, yan ew